

**TÎŞTÊN KU, JÎ TXTORÊ KU KURTAJÊ BIKARTÎNE
RE LAZIM IN:**

1. Belgeyek, ku nîşan dide, ku mirov li gor zagonan xizmeta şewirmendiyê standî be
2. Qerta sîgorta nexweşiyê û nivîsa hewalekirinê
3. Heqê tixtor pêşîn/next (di waxta serîledanê de bipirsin) ango nivîsa sîgortayê, ku misrefan hilbigre ser xwe (divê berê bête pêyda kirin)
4. Ku hebe, reqema grupa xwînê
Mîsal deftera dayîkan an jî belgeya xwîndayînê

Hûn dikarin agahdariyên berfireh ji broşura *Kurtajê a Yekîtiya pro familia yê Federal* bistînin:

www.profamilia.de

YEKÎTIYA PRO FAMILIA A EYALETA NRW Ê

Yekîtiya pro familia a eyaleta NRW ê wekî komelekî hatiye avakirin û di Nord Rhein-Westfalenê de bi 30 an zêdetir cîhên şewirmendiyê de xizmeta riya giştî dike. Em hem xizmeta şewirmendiyê didin û hem jî dixwazin di xalên jêrîn de bi riya civînan mirovan agahdar bikin:

- . Seksualîte û hevalbendî
- . Ducanî û plankirina malbatê
- . Pedagojiya seksuel û perwerdeya civatê

Mirov dikare çawa û li ku agahdarî ji bo xizmetên pro familia bistîne:

pro familia Landesverband NRW e.V
Postfach 13 09 01 * 42036 Wuppertal
Telefon: 0202 – 245 65 – 0
E-Mail: Iv.nordrhein-westfalen@profamilia.de

www.profamilia.de

**CÎHÊ ŞEWIRMENDIYÊ A PRO FAMILIA DI NÊZIKÎ
WE DE:**

**Agahdariyên kin ên tîbbî di
derbarê qedandina ducanî ango
kurtajê de**

**YEKÎTIYA EYALETA
NORDRHEIN-WESTFALENÊ**

Agahdariyên kin ên tîbbî di derbarê qedandina
ducanî ango kurtajê de

2015 Kurdisch (Kurmancî)

Mirov dikare ducanî bi dermanan an jî bi riya emeletê biqedîne (kurtaj). Her dû metod jî aliyê wan ê qenc û ê neqenc jî hene. Mirov nikare beje, metodekî ji metodê din qencir e, bê êşan e, an jî mirov dikarê wan metodan li gel hemû pîrekan bikarbîne. Pir caran girîng e, ku her pîrek an jî her jin bi xwe biryarê bistîne, ku ew dixwaze ji bo xwe bi kîjan metode kurtajê bikarbîne.

KURTAJ BÎ RÎYA DERMANAN

Kurtaja bi alîkariya dermanan dikare heta dawiya hefteya 9 êmîn a ducaniyê pêk were (ev yek tê maneya roja 63 êmîn, eger mirov ji roja dawî a xwîncuyîna ve hesab bike).

Ji bo vê yekê lazim e hûn çend caran biçin li gel tixtorê/tixtora xwe. Piştî axaftina bi tixtor û muayeneyê hûn dikarin sê tabletan bistînin û bi xwarina wan tabletan ducaniya xwe biqedînin. Ev dikare carna bibe sedema xwîncuyîna. Piştî dû rojan dermanekî din (tabletekî an jî fitilekî) tê girtin. Duh re ji we wê xwîn biçê û bi ve xwîncuyîna jî tevîna ducaniyê jî der bibe (wekî jiberçuyîna, ku zarokek berî qewlê xwe û miritî bê dinyayê). Gelek caran divê hun piştî girtina dermanê duyemîn 3-4 saetan li gel tixtor bimînin. Pir caran derman di vê demê de tesîr dike, bes kêman caran jî ev yek dikare 24 saetan jî bikşîne. Dibe ku ev hinek caran bibe sedema zikêşê (wekî êşa di dema xwîncuyîna pîrekan a mehanî) an jî xêrabûna gera xwîna. Ku hewcedarî hebe, hun dikarin dermanên êşê jî bistînin. Li gor tecrubeyan ev li gel sedî bist ên pîrekan de tê dîtin. Ev xwîncuyîna dikare 7 rojan heta 12 rojan jî bikşîne, carna zêdetir jî. Ev yek piranî ji xwîncuyîna mehanî zêdetir e. Piştî nezîkî 14 rojan qontrolê t pêk anîn, ku mirov bikarî be bawerî beje, daku kurtaj bi temamî pêk hatiye. Kêman caran dibe ku kurtaj baş pêk nehatiye û ducanî dom dike. Di rewşekî wisa de hewcedariya dermangirtinekê nuh an jî emeletêkî mumkîn e.

Komplikasyonên wekî xwîncuyînekê xeter, ku jê re gavên terapiyê lazim bin, an jî wekî enfeksiyonan kêman tînin. Derman dikarin kêman caran biben sedema bizlihevketin, vîrik û vereşînê.

KURTAJ BÎ EMELET

Kurtaj pir caran bi metoda hilandinê an jî kişandinê (aspîrasyona valayîyê) tê bikaranîn. Hinek caran bi riya verotin an jî rêş kirinê jî (kurtaj) çê dibe. Ev mudaxale pir caran di bin narkoza tevahî tê bikaranîn. Di narkozdayîna de tixtorêkê narkozê maddeya narkozê bi riya enjeksiyonê wê bide tamarên çengê we, da ku hunê di dema emeletê de xwew de dikevin. Dûh re deve rêhîm ano malzarokê bi alîkariya perçeyêkî û bi metal baldfarî tê firehkirin. Pir caran berî emeletê dermanekî tê dayîn, da ku devê rêhîm ango malzarokê nermtir bibe. Dûh re boriyekî zirav û plastik, ku bi hacetêkî hilandinê ve girêdayî ye, jî devê rêhîm re dirêjî nava rêhîm tê kirin. Bi vê yekê tiştê ku di nav malzarok de ye û nîşana ducanî ye, tê hilandin. Ev mudaxale nezîkî 10 deqîqayan didome. Piştî heman emeletê xwîncuyîna an jî zikêş mumkîn in, lê bes ev yek naye serê hemû pîrekan.

Kurtaj bi riya emeletê pir caran ambulans (pîrek ne mecbur in, di nexweşxaneyê de bimînin) têne kirin. Hun dikarin 1-2 saetan piştî emeletê di saegerin mala xwe, bes hun hê nikarî bin tenê derkevin trafikê an jî trimbêlêkî bajon. Ku mumkîn e, divê hun ne bi tenê vegebin, an jî kesekî bi xwe re binin. Di vê metodê de qontrolêkî piştî 7-10 rojan tê pêşniyar kirin.

Kêman caran û li gel hinekî pîrekan piştî emeletê komplikasyon derdikevin. Carna jî kurtaj bi temamî pêk naye. Vê gavê jî dibe ku hilandina rêhîma zarok a carekî din jî pêwîst be. Kêman caran rêhîma zarok dikare bête birîndar kirin. Bes ev jî xwe bi xwe sax

dibe. Carna jî ev dikare bibe sedema xwîncuyîna xeter an jî iltîhaban. Bes ev jî bi hêsanî dikare bete dermankirin. Eger hun pir zêde xwîn wenda bikin, pir biêşin an jî şewata we ji 38,5 °C bêtir be, ango behna xîna we ya der tê ne qenc be, lazim e hûn bilez biçin tixtorê/tixtora xwe. Eger iltîhaba we di demekî nezîk de ango bi temamî ziha nebe, ev dikare bibe sebeb, ku hun di pêşerojê de nikarî bin zarokan bînin dinyayê. Ji ber vê yekê, hinek tixtor di rewşekî wisa de antîbiyotîkan didin nexweşên xwe,

Komplikasyonên ku di dema narkoz dayîna de derdikevin holê gelekî kêman in.

PIŞTÎ KURTAJÊ

Ji ber ku hun bikarîbin rê li ber komplikasyonan bigrin, bi kîjan metodê dibe bila bibe, lazim e hun piştî kurtajê îstîrahat bikin. Gelek tixtor pêşniyar dikin, rojên piştî kurtajê bila tiştêkî negihîjê vagina we, ji ber ku hun bikarî bin rê li ber iltîhaban bigrin. Eger hun dixwazin bi dîqqet bin, bila tamponan bikarneyînin, bi zilamê/hevalê xwe re ranekevin, nekevin nav avê û neçin ajneberiyê. Xwe şuştin û duş kirin bê tirs mumkîn e.

Di roja kurtajê bi xwe de periyodekî nuh dest pê dike û hun dikarin di sa hêmilê bimînin. Ji ber vê yekê lazim hun berî her tiştî ji tixtorê xwe bipirsin, kû çawa hun karî bin xwe biparêzin. Dermanên ji bo rê li ber girtina ducanî (mîsal tablet) dikarin di roja ewil a kurtajê de bînin vexwarin.

Hîsên wekî rehetbûn an jî xemgînî, piştî kurtajêkî hîsên gelekî normal in. Komplikasyonên psîkolojîk beravajî vê yekê pir caran peyda nabin. Di rewşekî wisa de axaftinên bi kesên pispor dikarin alîkariya we bikin. Ji bo axaftinên heman rengî hun dikarin serî li şewirmendên pro familia bidin.